


Stratejiyên Şerên Dijîtal ên Guhertina Rûyê Cîhanê

(Şerê Sîberanî û xapandina dîtbar weke nimûne)

M.Osman Elî

-Einstein: "Nîgaş ji zanînê girîngtir e; bi rêya nîgaşê em dikarin paşerojê bibînin".

-Wezîrê Berevaniyê yê Amerîkayê, Lloyd Austin: "Şerê paşerojê, dê ne mîna şerên kevneşopî bin".



Pêşgotin

Li herêmên şer, pevçûnên siyasî û tevliheviyên civakî, êdî cografîya, artêş û stûnên dewletan beriya ku li ser erdê têk biçin, bi sedema bipêşketina teknolojiya û derketina nîfşên nû, ji aliyê ragihandin û elektronî ve li ber ketin û jinaçûnê ne.

Çimkî gelek teorî û têgihên bi sîkyolojiyên bandor, tereçûn û kontrolkirinê hatine guhertin, pê re jî hevsengiya hêzan, nexşeya hegemoniyê û rêgezên lîstikê jî hatine guhertin, îcar tevî ku torên înternetê û navgînên pêwendîyan têkiliyeke yekser û kêlîbikêlî di

nava kes û koman de peyda kirine, cografîya û dem nêzîk û kurt kirine û jiyan ber bi hêsanîyê ve birine, hemwextî wê, gelek aliyên propagandaya xwedî ajende jî ew keysbaz kirin û bi hemû hêza xwe ya madî û mirovî hewla sazîkirin û biçarçovekirina arasteyên raya giştî ya dijber kirin.

Di rûpelên bê de, em dê rêbazê şayesî (wesfî) ji bo lêkolîn û dahûrandina stratejî û karvedanên bikaranîna hêzên cuda ji nifşên modern re, her wekî teknîka pêşketî, ji bo jinavbirina armancên dijmin û rikberên xwe, bixebitînin.

Her wiha em dê hewl bidin ku bandorên wê yekê ji hemû hêlan ve li ber çavan raxînin, da ku şiroveyên beraqil bi rêya çavkanî û lêvegerên zanistî yên resen encam bidin (Lêkolînên berê, vekolîn, raport û programên televizyonî). Sernavên naverokên me behsa wan kirî jî dê wisa bin:

Yek: Şerê Sîberanî

Du: Xapandina Dîtbar

Sê: Encam û Dumahî

Yek: Şerê Sîberanî

Di nava rewşeke tijî pêşketin û guhertinên cîhanî de, êdî milkêşiya bandorkirin, kontrol û guhertina rûyê cîhanê hewcedarên lêvegera hizirîne bi awa û dînamîkeya şer in, nemaze bi guhêstina ji stratejiya leşkerî ya teqlîdî ber a fezayî ve, ku di vê stratejiyê de "Marşelên" ceng û pereyan ber bi bikaranîna (artêşên Sîberanî, karînen teknolojîk û cîhazên sehkerên ji dûr ve "long range sensors"), weke qadên dînamîk ên hêmanhevîgirtî, ve diçin. Ew jî bi armanca xuyakirina biserketin, hêz û karîna gefxwarina li mejiyan û xapandina wan, her wiha berxweve-anîna xerîzeyan, û birêvebirina xwediyên wan li gorî plansazî û ajendeyên ku berî niha hatine danîn.

Têgiha "Şerê Sîberanî" li wan şerên elektronîk ên sînoran derbas dikin tê kirin, ev şerên ku êrîşên elektronîk -ên sîstemên pêwendiyê bi lezeke sosret derbas dikin- serkêşiya wan dikin, di van êrîşan de cîhazên teknîkî û torên înterneta cîhanî tînin armancgirtin û jikarketinên bobelatî bi xwe re tînin.

Pirrê caran, şerên nû bi rêya teknîkên herî pêşketî tînin kirin, ev yek li gel piştevanîyeke ji hêla navendên lêkolînên teknîkî û gerînendeyên sîkolojîk û sîsyolojîk bi rê ve diçin û ji aliyê maldar, siyasatmedar û biryargehan ve tînin weberhênan. Armanc jî ew e ku-weke mînak-binesaziya alîgir û cemawerên partiya hakim û serdest an jî dewletê bi xwe xurtir bikin û moralê wan bilind bikin, li rex wê jî, rûreşiya kirinên rejîm, sazî û kesan carcaran sipî bikin.

Li nik eniya hundirîn, eniyeke şerî li derve jî tê vekirin; û êrîşên dijber li paş sînoran jî tînin kirin, armanca jî; tevlihevkirina tevna civakî, pêkanîna zererên herî gengaz di milên dînamîk de û tadarîkirina li çî kesekî li pêşiya stratejî, plansaziyên li ber dest û yê paşerojê dibe asteng. Helbet pirrê caran, ev yek bi rêya agahiyên derew, naverokên durrî rasiyê û bikaranîna teknîkên herî pêşketî yê xapandin û virran pêk tê, û tenê ji bo di vî şerî de bi ser bikeve. Lewra, û li gorî hemû nîşaneyan, cîhan di nava şerine ji hêla karînen ewlehî, berevanî û êrîşkariyê ve ne wekhev re derbas dibe, û êdî zehmet e encam û bandorên şerên modern bînin pêşbînkirin. Di vê çarçoveyê de em dê wateya "Şerê nifişê pêncem" û çekên di "Şerên Sîberanî" de tînin bikaranîn lêkolîn û gotûbêj bikin, pê re jî em dê karvedan û metirsiyên li ser hemû astan diyar bikin.

1) Şerê "Nifşê Pêncem"

Di şerên agahiyan an jî şerên nifşê pêncem (5G) de, hêz û dewlet – bêtir ku guleyekê jî biteqînin- şerekî bi rê ve dibin û dewletine mezin dikin jêr desthilatdariya xwe. Çimkî mekanîzmeya kontrolkirina artêş û fikirên gelan bi temamî hatiye guhertin û bi lezeke ku dibe kêmî 1 mîlîmetre di yek çirkeyê de be, pêk tê, ew jî bi rêya tecnîdkirina elektronîk a sîxuran û bikaranîna torên medyaya civakî û balafirên bêpîlot, di zerergihandina li ser hemû beşên pêwendî û deverên dînamîk de. Di encamê de, dewleta armancgirtî dê ji tevgerê were xistin û ji hemû hêlên jiyanê ve were bibendkirin, mijar hemû di destê kesên ku data li jêr kontrola wan in û tengezariyê di setalaytên çêkirî de pêk tînin.

John Robb, nivîskarê amerîkî di berhema xwe ya di derbarê şerên nifşê pêncem de, wiha behsa mijarê dike: "Ev şerekî ramanan e, babelîsokek ji tundiyê bi xwe re tîne û her bi wê ve diçe, bi rêbazê hilweşandina hêza dijmin, ji hêla derûnî û moralî ve, zêdetir dibe, ev hemû bi rêya encamdana operasyoneke ku bêhêvîbûnê li cem dijmin biafirîne ye, ji xwe meydana wê jî fezaya elektronîk e". (1)

Hin kes dibînin ku felsefeya şerê nifşê pêncem ji teoriya aborî (Hilweşîn û avakirin) a zaniyarê aborî û siyasî yê Amerîkî "Joseph Schumpeter" hatiye, ev teoriya ku vê dawiyê Condoleezza Rice, wezîra derve ya Amerîkayê ya berê di ragihandina têgiha (Kaosa Çêkirî " Creative chaos" de, sala 2005`an xwe sipartiyê, ew jî bi armnca avakirina "Rojhilateke Navîn a Nû", lê di her halî de, yê ku agahî û data (BIG DATA) li jêr destê wî bin, ew dê bihêztir û serwerê qadê be, her wiha dikare mercên xwe yên taybet li kompanyayên mezin û dewletan ferz bike, çimkî şerên îro jî derveyî saziyên mezin û zorxaneyên şerên meydanî ve tên birêvebirin. Tîmek ji bernamevan, sîxurên kirêkirî û rahêneran dikarin bi awayekî hêsan û bê zehemtî, her wiha bêtir ti ziyanên madî peywira bo wan haitye sipartin, pêk bînin.



Forma jimar (1)- Taybetiyên şerên nifşê pêncem

Li aliyekî din, şerên nifşê pêncem li gorî bendên exlaqî yan civakî û nirxeyî tevnagerin, û dikarin xwe bigihînin binesaziya civakî û rêgezên ragihandina niştîmanî, ji ber ku faktorên balkêşî û têçûnê yê girêdayî gihîna yekser a binesaziya datayên aliyê dijber li cem wan hene, û dikarin agahiyên şaş û derew biweşînin, toran derbas bikin û deverên dînamîk ên sivîl û leşkerî ji kar bixin (stasyonên enerjîyê, balafirxane, torên avê, kehrebe, sîstemên hişyariyê, makanîzmeyên berevaniya leşkerî û hwd.), ew jî bi rêya pêlên kehromexnatîsî ku ji devê topavêjên elektronîk derdikevin û bi mîlyaran dolar –weke xisar- li pey xwe dihêlin, çimkî bernamicên pîs ên ku sîstema elektronîk a dijmin teşfîr dikin, bi kar tînin.

2) Çekên êrîşkar ên Sîberanî

Helbet dema ku Koalîsyona (NATO)yê xeteriya şerên elektronîk di civînên xwe de girîng bibîne û di ber çavan re derbas bike, her wiha dema serokên dewletên mezin weke, Amerîka, Rûsya û Ewropa (Rojava) behsa zêdebûna êrîşên Sîberanî li dijî hedefên xwe bikin, dêmek ev yek ne ji valahiyekê hatiye û armanc ew e ku ev êrîş cihê xwe di serê lîsteya ajendeyên ewlekariya wan de bigirin, ne tenê wisa, lê belê mijar gihîştîye asta ku xeteriya van êrîşan, cihê xwe di nava bendê pêncem ê "NATO"yê de jî bigire, ku li gorî vî bendî; xeteriya li ser dewleteke endam a NATOyê, xeteriya li ser hemû endaman e. Ev metirsî û hişyarî di encama pêşketina karînen Sîberanî di dema me ya niha de ne, ku îro ev karîna bûne nîşane û xuyakirina hêz û derfetên her dewletekê.

Berê, hêza req (Hard Power), palpiştî birêvebirina qadên şer ên rûbirû bû, lê ji ber pêwîstî bi pêkanîna armancan bi awayekî tekûz, bilez kirina bidawîkirina operasyonên leşkerî û kêmkirina jidestçûyînan çêbû, evê yekê hişt ku mirov berê xwe bidin tecrûbeyên teknîkî yên berê, da ku hêzên berevaniya fezayî û êrîşkar bi xwespartina li ser çekên Sîberanî yên tekûz ava bikin, her wiha daneyên bi jîrîtiya çêkirî (Artificial intelligence) asê, çare bikin.

Bi vî yekê, êdî çavkaniyên enerjîya kehromexnatîsî bi rêya sîstema toran û cîhazên hişyariya pêşwext yên ku çavkaniya gefan destnîşan dikin û zererên ku dê çêbibin dinirxînin, diyar dibin.

Di van şerên elektronîk ên nûhatî de – ku leza wan ji ya deng xurtir e- gelek çekên êrîşkar ên elektronîk bi kualîteyeke bilind tên afirandin, bi taybet ew çekên ku xwe dispêrin enerjîya araste ya modern, her wekî "Pêlên tekûz- çekên microwave" (high-power microwave weapons), ku bi kurtenavê "HPM" tên nasîn û ji çekên herî girîng ên şerê Sîberanî ne. (2)

Weke mînak; Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê gelek lêkolîn di derbarê pêşketina "Çekên Microwave" de çêkin, û navê "Operasyonên Pelekut" li wan kir, ku leyzerê li ser hin parçeyên mejî ve dibin û di encamê de tevliheviyên tirs, bizdan û westîna çêdike, wekî çawa saziya (DARPA) çêkir, dema ku xwest zererê bighîne dil, û

damaran hilweşîne, û beraxaftina bihîstinê bi xwe re anî, heta asta ku ev çek li ser balafir û erebeyên leşkerî hat barkirin, da ku di şeran de bê bikaranîn.

Nimûneya herî nêzîk jî, bikaranîna Çînê ji "Microwave" re li dijî hêzên Hindistanê, di pevçûnên herî dawîn (Hizêrana 2020) de, ên li ser sînorên herdu welatan rû dan. Di wê pevketinê de, dema Çînê dît ku ew nikar xwe li ber êrîş, biserketina leşkerî ya Hindistanê û êrîşên li herêmên çiyayî (ku herêmên bilind ên çiyayê Hêmalayayê hatibûn dagîrkirin) bigire, cîhazên çekên "Microwave" li siwareyan bar kirin û tîrêjên wê avêtin lûtkeyên çiyê, di encamê de hêzên Hindistanê bi gêjbûn, westîneke ji nişkan ve û verîşînekê hîs kirin û demildest bi paş ve çûn û Çînê dikarî bi hêsanî wan herêman dagîr bike. (3)

3) Hin nimûneyên şerên Sîberanî

Ji ber karînen bêmepa yê çekên êrîşkar di hilweşînê de, êdî fezaya Sîberanî ya bêserûber bûye meydana şerê dewletan û nîşaneke metirsîdar a berzbûna karînen dewlet, hikûmet û kesan.

ما هي الجيوش السيبرانية؟
 فرع عسكري مكرس للحرب الإلكترونية والأمن
 السحابي والحرب الإلكترونية المضادة

مهامهم

- اختراق مواقع الخصوم والترويج لوجهة نظر معينة
- مراقبة وتحليل وكشف الأنشطة غير المصرح بها
- حماية الشبكات العسكرية وشبكات الدولة

أقوى الدول من حيث القوة السيبرانية

- الولايات المتحدة
- المملكة المتحدة
- روسيا

المصدر: Jakeleim

Ev yek bi armanca diyarkirina çalakiya embara elektronîk di qada xwecihê û cîhanê de, bi vê yekê, şer ji qerepalixê derbasî bêdengiya zingandî bû, her wiha pûtepêdan bi êrîşên elektronîk, sûcên Sîberanî û çetekariya ku gefê li awayên hizirîna cemawer dixwe, hat dayîn. Di encamê de Jîrîtiya Çêkirî bû sernavê herî balkêş ê şerê ku ji erdê veguhezî fezaya bêsînor. Êdî sazûmanîya ramanan û

têgihştina giştî kete jêrkontrola îdolojiya ewlehiya Sîberanî, ev

îdolojiya ku bi sed carî ji nîfşê çarem (G4) ê internetê xurtir e. li vir, em dikarin bi hin nimûneyên şerên elektronîk ên nûhatî bibîr bixin, ev şerên gelek jidestçûyîn li pey xwe hêlan û hiştin ku aliyên şer li xwe vegerin û deverên xwe yê dînamîk li dijî êrîşên elektronîk asê bikin. Ji van nimûneyên ku em behsa wan dikin ev in:

- 1- **Êrîşên elektronîk ên rûsî** li dijî wezareta derve ya Amerîkayê, û derbekirina hilbijartinên serdema serokê berê yê Amerîkayê Donald Trump, her wiha jikarxistina lûleyên petrolê yê Amerîkayê "Konyal" heta çend rojan.

Rûsya, her wiha êrîşên Sîberanî di şerê xwe yê bi Gurcistanê re sala 2008'an, û bi Nîvgirav Qeremê re sala 2014'an keysbaz kir, ev ji bilî pûçkirina datayan û jikarxistina sazûmeniya komputerên taybet bi hikûmeta Ukraynayê, bi rêya cureyekî ji bernameyên pîs ê bi navê "Wiper".

- 2- **Derbaskirina Artêşa Elektronîk a îranî** (girêdayî Pasdarên Şoreşger e) ji hesabên fermî û deverên dînamîk li Îsraîlê, hin ji wan jî vedigerin kompanyaya "ARAMCO" a Erebiştana Siûdiyê, li rex hin saziyên Qeterê û **bikaranîna vîrûsa "stuxnet"** a pîs di derbekirina Îsraîlê ji kargeha "Nitniz"ê re, ya nukleerî ya Îranê, di nîsana 2021'an de.
- 3- **Bikaranîna Îsraîlê ji bernamicê (PEGASUS) re**, dema sîxurî li telefonên rojnamevan û çalakvanên muxalif kir.

4) Xeteriya şerê Sîberanî û karvedanên wê

Di bin siya pêşbirka biçekirina elektronîk a encama şoreşa dijîtal, hêzên navdewletî û herêmî derbasî şerekî nû dibin, ev şer li ser bingeha bikaranîna Jîrîtiya Çêkirî (Rista rehî ya hevpeymanên bê), da ku artêş, kompanyayên darayî û binesaziya dînamîk di armancgirtinên xwe de zêde xurt, bi ewle û tekûz be (Afirandina mirov ji robotan re), pê re jî xeteriya benadorên ji ber şerê Sîberanî-ku li dijî cîhanî tevî gefek e- zêdetir dibe, çimkî serwerî û biserxwebûna biryarên dewletan her ku diçe li gorî berjewendiyên kompanyayên teknîkî yê ku sînoran derbas dikin, çetekarîyê,

sîxuriya elektronîk, torên sûcên birêxistinkirî û ji bilî wan... tev digerin. Lewra em dibînin îraroj astengiyên ku derdikevin rêza hevirkar di mijara parastina ewlekariya xwe ya Sîberanî ya cîhanî de dikin yek. Her wiha li gorî pîvana metirsiyan a ku ji aliyê kompanyaya **Allianz** ve derketiye; metirsiyên Sîberanî –li ser asta cîhanê sala 2022`an- ji bo kompanyayan cihê nîgeraniyê ne. (Pîvana Allianz a metirsiyan: raporteke salane ya kompanyayê ye, metirsiyên herî girîng ên ku dibe di mehên bê de ji vê salê arasteyî kompanyayan bibin, destnîşan dike).⁽⁴⁾

Bi her halî û bi kurtî, metirsiyên mezin ên ji ber bipêşveçûna şerê Sîberanî ev in:

- Jidestçûyînen aborî, û sûcên elektronîk ku dibe bi mîlyaran dolar be, her wiha falincbûna tevgera bazirganiya cîhanî.
- Derketina rageşiyê di têkiliyên diplomatîk ên dewletan de û kêmbûna pevbaweriyê di nava hevkarên de.
- Metirsiyeke rasteqîn li ser ewlehiya nukleerî li cîhanê çêdike, lewra ne dûr e ku şerekî nukleerî yê elektronîk rû bide.
- Jikarxistina elektronên bêliv li deverên dînamîk, ji gefxwarina li kompanyayên petrol û xazê bigire, heta di qutkirina kehrebeyê li cîhanê ve derkeve, (Tecrubeya qutkirina kehrebeyê çend saetan ji ser eyaletên rojhilatî li Amerîkayê).
- Hilweşandina makanîzmeyên berevaniya sivilî û leşkerî û çêkirina metirsiyekê li ser çalakîyên dewletan ên hestiyar.
- Gelek dewletên mezin û kompanyayên cîhanî dibin dîlê heqaret û rehma torên sîxurî û têçûnê, ku pîrrê caran gelek pereyan weke fidiyeyê dixwazin (beriya niha li 200 kompanyayên amerîkî hat ferzkirin).
- Zêdebûna dûrahiya ji hêla agahî û teknîkî ve di navbera dewletên cîhanê yê pêşketî û paşketî de.
- Derbaskirina sazûmeniya datayan û hesabên xerîdaran, her wiha bînpêkirina mulkiyeta fikirî û taybetmendiyên kesan.
- Qutbûnên sereke yê teknolojîyaya agahiyan û derbekirina platformên elektronîk û jikarxistina wan (Wekî çawa beriya niha bi kompanyaya Meta "Facebook berê" çêbû; dema ku derdora 6 saetan xizmeta wê li seranserê cîhanê hate qutkirin, di 4`ê cotmeha sala borî de).

- Zêdebûna bînpêkirinên ewlekariyê û bikaranîna fezaya elektronîk di hevahingî û pêkanîna êrîşên terorîst li dijî berjewendiyên xelk û dewletan.

Di derbarê ziyanên mezin ên ku ji ber bînpêkirina dîwarê Sîberanî yê biewle encam didin de, bi rastî, dane û jimarên nîgeran derketine, li gorî serjimariya jîdestçûyînan elektronîk ên sala 2021`ê, derdora 6 tirîlyon dolar e. Tê pêşbînkirin -li gorî pîsporan- ku ev hejmar di sala 2025`an de xwe li bêhtirî 10 tirîlyon dolarî bixe, vê yekê hişt ku dewletên weke Amerîka, Çîn û hin hêzên Rojavayî aliyê xwe yê dijîtal asê bikin û budceyeke serbixwe ya salane -bi mîlyonên dolaran- ji bo misogerkirina ewlehiya Sîberanî û rêgirtina li ber xeteriyên ku tîn pêşbînkirin dê li dijî çalakîyên wan ên dînamîk û saziyên serweriyê pêk bên, veqetînin. (5)

Li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê bi tena serê xwe derdora 879 hezar pîspore ewlehiya Sîberanî di nava jimara karmendan de hene (6). Li ser asta cîhanî jî, ferq gelekî mezin e, û pêwîstiya bazarê bi derdora 3.12 mîlyon karî di vî warî de heye, ev li gorî rêxistina (ISC)²; ku ew jî rêxistineke navdewletî û bê fêde ye, bernamêyên rahînan û bawernameyên di warê ewlehiya Sîberanî de pêşkêş dike.

Li gorî tişta me li jor gotî û dûrî karînan dewletên bi sîstemên nû yê ewlehiya Sîberanî biçekirî, pîraniya welatên Rojhilata Navîn bidûrî biçekirina fezayî ne û karînan birêvebirina şerekî ji dûr ve (şerê paşerojê) li cem wan tune ye, ji bilî hin dewletên mîna Îsraîl û Îranê û hin dewletên kendavî ku budceyeke serbixwe ji bo ewlehiya Sîberanî veqetandine. Lewra çî aliyekî ku bi teknîkên girîmane di her şerekî paşerojê yê ne bi çekên teqlîdî de nizanibe, bê guman dê bi ser nekeve. Li aliyekî din, û hêjayî gotinê ye, ku rêgezên êrîşkariyê û tolhildana modern dê encamên sosret bi xwe re bînin, her wekî jîkarxistina komputer, sîstemên guhdanê û pêwendîyan, her wiha têçûna Aplikasyonan û taybetiyên ewlekariyê. Îcarê di encamê de, senaryoya herî xerab û nêzîk li pêşiya aliyê armançgirtî, xweradestkirina bo êrîşên pîs û binakok, nemaze ku torên elektronîk ji aliyê rêxistinên radîkal û terorîst ve, an jî aliyekî bixwaze tola xwe hilîne- ji ber ku ne li gorî berjewendiyên wan in- bên birêvebirin.

Du: Xapandina Dîtbar

Wêne xwedî roleke sembolî û bandoreke -ku bi sedemên belgekirin û hunerî tê bikaranîn- e, hêmana piştrastî û bdewiyê li bûyeran zêde dike. Her wiha heta niha jî weke amûra qaîlîkirinê ya rast û biderbirîn ji bûyerên dîroka mirovahiyê re tê pejirandin, çimkî wêne weke ku tê gotin "Bînera ku bi hezarên gotinan kurt dike ye" û di çarçoveya zengînkirina bîrdanka dîtbar a gel û neteweyan de "ji peyîvînê, rewanbêjtir e".

Ev heta radeyekê dihat yeqînkirin, beriya ku teknîkên lîstina bi wêneyan bi pêş bikeve, ji naveroka xwe ya rast bîr bidûrxistin û ji rêya xwe ya rast derkevin, weke şeweyekî xapandina cemawer û çarçovekirina wan li ber çav, çî di hêldora destbiserkirin, jêbirin û windakirinê de, çî jî di hêldora parçekirina hêmanên wêneyên neliv û biliv de, mijar li vir ranewstiya, lê belê bi pêşketina teknîkên xapandina bi rêya wêneyên dîtbar, rewş xerabtir bû, nemaze bi rêya teknîkên "Sextekariya kûr – vepeyvîna reyalîst" (Deep Fake - Realistic Simulation), û biçarçovekirina dîtbar a bûyeran bi wêneyê wê yê nûçêkirî (Visual framing of events).



Forma jimar (2)- Teknîkên xapandina dîtbarî

1) Teknîka "Sextekariya kûr" û Nenasîna tiştê beraqil

("Deep Falsification" "denial of plausibility")

Sererastkirina wêneyan ne tiştêkî nû ye, lê bipêşketina amûrên "Grafiika dijîtal" hemwextî jîrîtiya çêkirî û qayilkirina dîtbar, gelek vîdyoyên cuda û sererastkirî bi xwe re anîn, ku tu dibêjî qey ev vîdyo rast in û dûrî rastiyê xwe ne, heta asta ku wêneyên neliv û kevin dikin vîdyoyeke biliv û zindî, û kesayetên mirî dilivînin. Binavûdengiya vê teknîkê hişt ku bibe rêyeke bikaranîna şantajê li dijî raya giştî, pê re jî, qurbanên van kirinan di nava gefxwarin û tevliheviyên derûnî de winda dibin.

Di operasyonên xapandina ragihandina dijîtal de, bi teknîkeke xweser bernamic tîn bipêşxistin, ew jî piştî diristkirina dijîtal a bigirêk ji hûrgiliyên dîtbar ên zirav, bi taybet lêbarkirin û guhertina xisletan û sererastkirina deng, ku di encamê de karîbe bandorê li nexşeya dijîtal a wêne bike. Di çêkirina naveroka dîtbar û bihîzbar de aplikasyonên weke (Reface, Wombo û Zao...) tîn bikaranîn.

Tecrûbeyê şerê Rûsya-Ukrayna, qadeke çalak a çêkirina vîdyoyên sexte di derbarê serokê Ukraynayê de " Volodymyr Zelensky" bû. Beriya niha heman tişt bi serokên Amerîkayê "Donald Trump" û "Barack Obama" re jî çêbûbû, her wiha bi gelek navdarên cîhanê re.

Di milekî din de, û ji ber metirsiyên bikaranîna vî teknîkê, Ajansa Polîsa Ewropî "EUROPOL", hişyariya bikaranîna teknîka "Sextekariya kûr" di cîhana sûcan de da, ji ber karînen wê yê dihêle ku kesek li ser torên înternetê derkeve û tiştên ku beriya niha nekirî û gotinên beriya niha negotine, bike û bibêje, anku zirkesîkirin bi xwe ye, û ne dîr e ku encamine tehlûke bi xwe re bîne; eger ev teknîk kete destine ne cihê baweriyê. (7)

Ji ber vê yekê, teknîka "augmented reality" dikarîbû bi hêsanî nasnameyan sexte bike û zirkesîkirin ji aliyê pîspor û sûcdarên înternetê ve bê kirin, her wiha her tişt pê hat sextekirin, lewra dibe ku encamên gelekî zerermend bi xwe re bîne û ev yek bihêle ku:

- Xapandina ragihandinê derkeve, û sûc, dizî, devavêtin û piçûkxistina elektronîk berbelav bibin.
- Çanda "Nenasîna tiştê beraqîl" ku tê de rastî û sextekarî tev li hev dibin, belav bibe.
- Bînpêkirina taybetmendiyan û bigumandîtina rastiya tiştan, nemaze bi guhertina xisleyên kesayetî li hin deverên ne gunacv.
- Dizîna nasnameyê û bidestxistina destkeftîne ne rewê, ew jî bi rêya zirkesîkirin û derbasbûna ji telefon û hesabên bankî re.

- Reşkirina navên kesayetên navdar û pêşengên civakê, heta piştî keşfkirina sextekariya vîdyoyan jî.
- Sextekariya li deng, ku dihêle baweriya me bi her deng û telefoneke ku ji me re bê, neyê.

2) "Metaverse" û "cîhana hevseng"

Kî dizanîbû ku rojekê ji rojan em ê silavê li kesekî bikin an jî li bazarê bigerin bi awayekî elektronîk?! An jî em şahiyên li dar bixin û mîna tiştê li ser erdê, li fezaya dijîtal jî were pêkanîn?! Ev hemû bi teknîka "Metaversa" re, berhema herî nû ya salê êdî bû cihê baweriyê û gengaz, ev teknîka ku têgih, reftarên xelkê û şeweyên jiyanê di nava torên bigirêk ji cîhanên dijîtalî guhertin, ku jîngeha madî û rasteqîn û cîhana girîmanê ya tenê dîtbar, li hev dicivîne.

Derketina têgiha "Metaverse" vedigere nivîskarê amerîkî "Neil Stephenson" ku di romana xwe ya nîgaşê zanistî ya bi navê "Hilweşîna Berfê (Snow Crash) de bi kar aniye. Naveroka romanê têkildarî kesine girîman û zindî ye, di avahiyeke 3D û hin avahiyên din ên bi vî rengî de hevûdin dibînin, ev jîngehên ku carê behsa dîrok, zimannasî, Înserpolojiya, zanistên ol, zanistên komputer, siyaset û teşîrkirinê dikin.

Her wiha, guhertina navê "Facebook" bo "Meta"yê jî yek ji rêzerêkarên dijîtal ên girêdana di navbera cîhana girîmanê û teknîka "Metaverse" de ye; ya ku pisporên teknolojik li benda wê ne ku rewşa heyî ya torên dijîtal bi platform û kompanyayên wê biguherîne û aso û derfetên nû di pêvajoyên (Bazirganî, xwendin, lidarxistina çalakiyên rahînanê, danûstandina pereyên dijîtal û dîzayinkirina odeyên nûjdariyê), ku hemû xizmetên dînamîk ji mirovahiyê re pêşkêş bike, bi rêya wêneyên sembolîk ên ku şeweyên rasteqîn bi rêya bikaranîna berçavkên jîngeha girîmanê (Virtual Reality), telefonên pêşketî û hin alavên mîna wan û li gorî (warê giştî) yê ku li ser esasê tegeriyana navbera kesan û koman de bi awayekî yekser û bêyî ku rastî çavdêrî û astengiyên pêwendiyê were, pêk tên.

Li gorî tişta me li jor gotî, gelek kompanyayên elektronîk ên cîhanî dikarîbûn gavên biceger biavêjin, nemaze di dema derketina vîrûsa Coronayê de, ku makanîzmeyên pêwendiya dijîtal di nava xelkê de ber bi pêş ve birin. Her wekî kompanyayên "Microsoft, Meta, Apple, Amazon", ku jîngeha xwe ya dijîtal, alav û naveroka xwe kirin 3D. Mijar li vir ranewestiya, lê belê heta bi dewletan ketin nava rikberiyekê de; da ku jîngeheke girîmane (Virtual Reality), a mîna neyarê xwe di warên stratejiyên leşkerî, plansaziyên ewlekarî –bi awayekî dîtbar- û ji "Cîhana Hevseng" (A parallel world) çêbikin.

Di nava van pêşketinên teknîkî de, zaniyarê teknîkî "Louis Rosenberg" nîgeraniya xwe ji ber karvedanên "Metaverse"ê tîne zimên û dibêje: "Bikarhêner dê azadiya bijartinê nebînin, û dê nikaribin xwe ji sîstema "Augmented reality" a taybet bi wan, veqetînin, di encamê de dê bikevin rewşeke civakî, aborî û fikirî ya neguncav, her wiha bi hêsanî dê dîzayinkirina pêkhatiyên girîmane (default compositions) ji bo zêdekirina dabeşiya siyasî û civakî, paşguhkirin û bidûrxistina hin komikên destnîşankirî û jînavçûna bawerî û bipêşketina kînê, bi rê ve biçe". (8)

Ji ber ku di encama rêzepêşketinan de derketiye, bi rastî jî mirov nikare pêşbîn bike bê ka teknîka "Metaverse" -halê hazır- dê çi bi xwe re bîne?! Lê weke wê, weke her teknîkeke dijîtalî, dê aliyên wê yên erênî û neyînî hebin, û zehmet e em karibin di cîhana xwe ya dijîtal de dest jê berdin, her wiha dê mijar di çarçoveya têgeryana xelkê di nava hev de nemîne, lê belê ev tenê - bi rêya rêzenavgiyên dijîtal- weke destpêka girêdana çendî di navbera jîngeha madî û gerrestêra erdê de ye. Ew cîhaneke nû ye; ku dê rûyê cîhanê serûbinî hev bike, li vir dê tenê dewletên pêşketî –ji hêla teknîk û zanistê ve- pêşeng, û xwedî biryar û serwerî bin, ev yek di bin siyaya guhertina qanûnên şer û biçekirina dijîtal de.

3) Biçarçovekirina dîtbar a bûyeran

Wêneyê ku di demekê de tê kêşan û careke din di dem û cografîyayeke cuda yan pûyerine cuda de bê belavkirin, ew wêne encamê teoriya "Biçarçovekirina Ragihandinî" ye, ev teoriya ku

weke xetertirîn teoriyên çêkirina raya giştî û berzkirina wê ye, di vê teoriyê de bûyer û dîmen ji rêya xwe tîr derxistin, anku di rêne alîgir de tîr bikaranîn, heta asta ku gotina "Yê bihîstîye ne weke yê dîtîye ye" nema dikare rastiya bûyran piştrast bike, çimkî yê dîtîye dibe ku qurbanê sextekariya bîrdanka dîtbar a bi rêya wêneyan be, îcarê li vir, girîngiya teknîkên modern, di encamdana çîrokên bi dîmen, ên bi îdolojîya kesê peywendîdar çaçrovekirî ye, diyar dibe, ku tê de hin alî tîr berzkerin û hin jî tîrê paşguhkerin (bidûrxistina zanînê " Cognitive exclusion"), ew jî bi armanca gihandina hin nameyên destnîşankirî bo raya giştî.

Pirrê caran, wêneyê ku gelekî tê biparvekerin û belavkerin, bandora xwe ji naveroka nivîskî (deq) bêhtir e, ev yek li karînen wêneyan ên bihêz û bilind di meseleya qayilkerin, bidestxistina hevxiyê cemawer û balkêşiyê de vedigere; çimkî wêneyê biliv an jî bêliv bi serê xwe zimanekî cîhanî yê ku astengiyên navneteweyî derbas dike ye û pêwîstiya wê bi zanîn û asteke bilind a baldariyê, weke tekestt (deq) tune ye.

Di wextekî de ku çanda dirûv li ser hesabê naverokê û çêja formê li ser hesabê nîrx û kêrhatiyê derketiye pêş, şaxên wêneyan derbasî mejî û nîgaşa cemawer dibin, êdî zehmet dibe ku bandorên encamdan bîr kontrolkerin, di wextekî de ku aliyê nîgaşê- çî li ser asta bidestxistina zaniyariyan û belavkerina pêşdarazan an jî li ser asta kontrolkerina nîrxên civakî û hilberandina bîndestiyê mejîyî (şûştina mejî)- û bandora derûnî ya li ser esasê xapandina bi wêne di rewşên sîmulasyon û guhêziya ji efêktên dîtbarî.



Forma jimar (3)- Bandorên wêne

Dibe ku gelek şêweyên "biçarçovekirina dîtbar" hebin, her wekî "bidûrxistina wêne ji rastiya wî (contextual deception), ku li ser bingeha jinûve-hûnandina bûyeran û hûrguliyên wan ava dibe; (bidûrxistina wêne ji koka wî ya demî û cihî û jinûva-modernkirina wî di jîngên mîna yên berê de), her wiha bikaranîna sernûçeyên ji hêla naverok û teşe ve balkêş, da ku cemawer di deryaya nîgaşê de noq bibe, gengaz e ku giraniyê bide kontrolkirina surîştê naveroka dîtbar jî, da ku bihêle yê wergir hêmanên wê nas bike, bi wan bifikre û derbarê wan de nîgeran bibe, di encamê de û li ser hesabê mijar û naverokên din, serkêşiya tercîhên wî bike, di çarçoveya berjewendiyên xebatkarên bi pêwendiyê radibin. Bi kurtayî ev e naveroka teoriya " rêzkirina ejende û tercîhan (Arrange the agenda and priorities)"e, ya ku "Walter Liebman" beriya sed salî piştgiriya wê dikiir.

Li aliyekî din, dibe ku gelek caran mesele bigihêje asta derewandina bûyeran û jibaxweçkirina dîmenan, da ku raya giştî bixapînin û li pey



ejendeyên propagandayê yên ku berê hatine çêkirin bikevin. Li vir em dê mînakekê bi bîr bixin; ew jî lêpirsîna ku ajansa *Associated Press* a amerîkî – beriya derdora 3 salan derbarê piştgiriya Tirkiyayê ji pêngavên propagandayê yên sexte li ser "Twitter" û "Instagram"ê çêkiribû de

ye, ew jî bi armanca pêkanîna bandorekî li raya giştî ya cîhanî, têkildarî êrîşên wê yên leşkerî li dijî bakur-rojhilatê Sûriyayê, ku wê demê di çarçoveya pêngavan de nema, lê belê hin wêneyên ji ajansên biyanî û bidûrî bûyerên Sûriyayê jî dizînin û belav kirin, her wekî ew wêneyê ku hatiye kişnadin û gotibû (Tirkiye) ku ev leşkerekî tirk e, avê dide zarokeke sûrî, lê di rastiye de, ev wêne sexte ye û yê ajansa *Associated Press* e, ku sala 2015`an hatibû belavkirin.⁽⁹⁾



her wiha wêneyekî din jî gelekî hatibû biparvekrin, ku qaşo yê jineke sûrî û leşkerên tirk ew hilgirtine ye. Ev wêne li ser Twitterê gelekî belav bû, lê di rastiya xwe de, ev wêne jî yê ajansa *Associated Press* e, û sala 2010`an di dema rizgarkirina xelkê ji

tûfanên avê yên ku li Pakistanê rabûbûn de, hatiye kişandin.

Ev ji bilî dîmenên piştgiriya leşkerî ya tirkî ji bo pêkanîna operasyoneke leşkerî ya nû li rojhilatê Firatê, ev dîmenên ku wêneyên zirîpoş û karwanên leşkerî yên Tirkiyayê di nava xwe de dihawandin, ku qaşo amadekariyên "şerekî mezin" in. Li gorî mînakên me li jor anîn zimên, diyar dibe bê bikaranîna wêne çiqasî dikare cemawer –di çarçoveya piştgiriya nûçeyên Tikriyayê de- bixapîne. Îcarê metirsî îrroj- ji her demek din- di naverokên ku têgeryan û cemawerê wan heye de ye, ji ber ku hejmara bikarhênerên platformên medyaya civakî li cîhana dijîtal her ku diçe zêdetir dibe, û belavokên xwedî wêneyên sexte dibin "Trend" û şûna raya giştî digirin (li jêrdestiya jinûve-sererastkirina li gorî siyasta ku tev digere

ye), û gelek şopîner, parvekirin û hevxemiyê bi dest dixin, û pirrê caran, kiryarên tund û bikîn bi xwe re tînin; (Dijminatîya welatîyên tirk derheqê koçberên sûrî, her wiha yên rastgirên rojavayî yê radîkal derheqê biyaniyan de).

Li gorî tiştên me gotî, wêne eger ji derveyî çarçoveya xwe hate bikaranîn an jî keysbazî li (reng, sîmayên kesayetî, cografîyaya herêmê, kûrahî û goşeyan) hat kirin, ev tişt di kategoriya "jirêxistina rojnamegeriyê bi rêya paşguhkirin û xapandina sîstematîk" cihê xwe digire. Lewra bi tevlihevbûna berjewendiyan, xurtbûna rikberiyê di navbera neyar û biryardaran de re, ev yek gelekî bi pêş dikeve û di encamê de; exlaq û berpirsyariyên civakî yên taybet bi pîşeyê (dema ku bîst belavkirin) wîndî dibin û tenê aliyê xapînok ê wêneyê sererastkirî û îdolojîkirî bi kualîteyêke bilind dimîne.

Sê: Encam

Li gorî şayîs û dahûrandina me li jor kirî, em dikarin encaman bi çend hevokan kurt bikin:

- 1- Şerên nû dê ne mîna yê berê bin, dê pirr bêdeng û ji yê kevneşop xirabtir bin. Çimkî metirsî û bandor dê li ser hemû beşên dînamîk bin (Leşkerî, ewlehiya agahîyê, nukleerî, aborî, siyasî, tenduristî, torên pêwendî û kehrebeyê û her tiştê ku li ser enerjîyê dixebite).
- 2- Şer dê ne birêxistinkirî û pêşbînkirî bin, lê belê di tektîk û stratejiyên xwe de dê ji nişkan ve û sosret bin, ku hesabên her kesî têxe metirsiyê, û ne dûr e ku welatên mezin jî bibin qurbanên vî şerî, lewra pêşbînkirina encaman ne pêkan e, nemaze ku jêdera gefê nenas be.
- 3- Dibe ku di encama şerên Sîberanî de hin welat derkevin pêş û hin jî ber bi jor ve dakevin, her wiha rewşên şantaj, têçûn û gefxwarinê zêdetir bibin.
- 4- Wê yeqînî û guman, û rastî û nîgaş tevlihev bibin, her wiha raz û taybetmendî bîna bînpêkirin û li ser hesabê kûrahî û dahûrandinê dê bedewiya dîtbar derkeve pêş. Li aliyekî din dê parastina serweriya dewletan û deverên wê yê dînamîk tiştêkî zehmet be.
- 5- Rêgezên şerê ewlehî û pêşbirka biçekirina dijîtal dê bîna guhertin, û dewletên ji hêla zanist û teknîkê lipêş dê -li ser asta cîhanî- xwedî serwerî û biryar bin.
- 6- Di serî de teknîka "sextekariya kûr", wê teknîkên xapandina dîtbar rûyê cîhanê biguherînin, îcarê dê rêgezên bawerî û rastiyê hilweşin û di encamê de tenê tiştê sexte dê cihê baweriyê bin û ya resen dê were derwandin. Pê re jî wê jihevderxistina rastî û nîgaşê pirr zehmet be, û ne dûr e ku navê gelek navdar, dewlet û hikûmetan bîna reşkirin.
- 7- Bi teknîkên sererastkirina pêşketî ya naveroka dîtbar, dê jicemxwe-derxistina bûyeran û bidûrxistina wan ji rastî û koka wan hêsan bibe, her wiha dê nasîna aliyê xapînok ê wêneyan (ên biliv û bêliv) û şopandina rûyên derewan zehmet be.

Dumahî

Têketina nifşên şerê niha yan jî yê paşerojê û stratejiyên wan ên bandorkirin û qayilkirinê, ku bi wan re, guhertineke berevajî di çarçoveyên têgih, nasnaemyên çandî, arasteyên siyasî û heta bi şêweyên jiyanê pêk tên, li ser me ferz dikin ku gerek e bi lez em di derbarê encamên hegemonî û desteseriya dijîtal û xapandina dîtbar hişyar bin, û pêşketinên dûvhevhatî li qada girîmane li ber çavan derbas bikin, her wiha asêkirina binesaziya hundirîn bi sazûmanîyeke hevtemamkirî; ji nirxên zanistî yên pak, têgihaştina dijîtal û ewlehiya agahiyî. Helbet ev yek bi rêya hevkarî û xebatên takekesî û komî û asteke bilind a hevahingiya (teknîkî, agahiyî, rojnamegerî, ewlehî û derûnî..) di navbera desthilatdarî, dewlet û kompanyayan de pêkan e, da ku warên xebatên dijîtal bî kontrolkirin, li ber kunên teknîkî bê girtin, zagonên hişk bî derxistin û rêkar li dijî operasyonên zirkesîkirin, têçûn, teşfîr û şantajê dijîtal bî standin. Ev yek, eger xapandin û sîkolojiyên bandorkirinê ne ji ode û gerîndeyên fezayî yên bi ser dewlet, hikûmet û kompanyayan ve derketibin, çimkî wê demê mesele dê cuda be û dê pêwîstî bi xebatên navdewletî û navneteweyî ji bo sererastkirina rêgehên dijîtalê di çarçoveya berjewendiyên giştî de hebe. Ev xebatên mijara gotinê jî dikarin bi rêya ofîs û desteyên bêalî yên navdewletî û odayên çavdêriya dijîtal ên ji hêla teknolojiyayê ve pêşketî bi rê ve biçin. Li rex vê yekê jî, bikaranîna Aplikasyonên ku bernamicên pîs û aliyên xapandina dîtbar keşf dikin, veqetandina budceyeke serbixwe ji bo piştgiriya ewlehiya Sîberanî û piştgiriya platformên xwedî naverokeke erênî. Ev ji bilî bikaranîna erênî ya teknolojiya dijîtal di warên pêşketina (bijîşkî, rojnamegerî, aborî û civakî...), bi armanca bîchanîna erkan bi xebat û kualîteyeke bilind û di zûtirîn dem de.

Li hemberî ezezî, çavnebarî û şer; çarenûsa tevahiya mirovahiyê yek e, çimkî yek parçe ji giştî ye û berevajî wê jî rast e, lewra, di cîhana "li paşxaneyê girîmane" (Beyond the default) hemû senaryo li pêşîya me ne, û paşerojê dê ji me re destnîşan bike; bê ka kî wê rêgezên desteserî û hukimkirinê kontrol bike.

Çavkanî:

(1) زهير حمودي الجبوري، مقال بعنوان "العراق وحروب الجيل الخامس"، موقع "مركز النهرين للدراسات الإستراتيجية"، نشر بتاريخ 13 مارس/ آذار من عام 2022، الرابط الإلكتروني:

<https://cutt.us/wsP5y>

(2) محمد عبد الخالق مساهل، مقال بعنوان "دراسة جديدة تكشف عن أساليب الصراع لهدم الدول وتفتيت المجتمعات..حروب الجيل الخامس صانعة الدمار الكامل"، موقع "المصري اليوم"، نشر بتاريخ

13 ديسمبر/ كانون الأول من عام 2021، الرابط الإلكتروني: <https://cutt.us/pbBhy>

(3) تقرير بعنوان "الميكرويف مصير الأعداء"، موقع "ميدل ايست أونلاين"، نشر بتاريخ 12 مايو/

آيار من عام 2021، الرابط الإلكتروني: <https://cutt.us/JTaNb>

(4) تقرير بعنوان "التهديدات السيبرانية تقلق العالم.. فديات مالية وأضرار كبيرة"، موقع "العربي"،

نشر بتاريخ 21 يناير/كانون الثاني من عام 2022، الرابط الإلكتروني:

<https://cutt.us/7TBNT>

(5) تقرير بعنوان "الجرائم الإلكترونية.. كم تكلف العالم؟"، موقع "جاك العلم"، نشر بتاريخ

1 فبراير/شباط من عام 2022، الرابط الإلكتروني: <https://cutt.us/VOIBT>

(6) تقرير بعنوان "العالم يبحث عن خبراء الأمن السيبراني"، موقع "الحرّة"، نشر بتاريخ 30

مايو/آيار من عام 2021، الرابط الإلكتروني: <https://cutt.us/58mSW>

(7) تقرير بعنوان "يوروبول" تحذر من تزايد استخدام تقنية "التزييف العميق" في عالم الجريمة"،

موقع "يورونيوز"، نشر بتاريخ 29 أبريل/نيسان من عام 2022، الرابط الإلكتروني:

<https://cutt.us/54SMr>

(8) تقرير بعنوان "الواقع قد يختفي بسبب "ميتافيرس"!..خبير يحذر"، موقع "العربية نت"، نشر

بتاريخ 16 نوفمبر/تشرين الثاني من عام 2021، الرابط الإلكتروني:

<https://cutt.us/v2QXm>

(9) تقرير بعنوان "هكذا استخدمت تركيا حملات مضللة على "تويتر" حول الهجوم على سوريا"،

موقع "العربية"، نشر بتاريخ 9 نوفمبر/ تشرين الثاني من عام 2019، الرابط الإلكتروني:

<https://cutt.us/FABjW>